



Vaksîna xurtkirinê bi vaksînê mRNA (Pfizer/BioNTech, Moderna)

Vaksînên mRNA gelekî baş hemberî nexweşiya kovîd-19 ya razana li nexweşxaneyê diparêze. Lê, wê di kesên 65 salî û jortir de nişan daye ev parastina vaksînê dikare di dirêjîya wextê de kêmtir bibe. Em li van kesan tewsiye dikin bi destpêka meha 6 piştî vaksîna dawîn vaksîna xurtkirinê li xwe bidin. Heya niha, bo kesên 65 salî û jortir tu kêmbûna parastina vaksînê hemberî nexweşiya giran nehatiye dîtin. Lê, parastina hemberî nexweşiya ne-giran û hemberî veguhestina vayrusê di dirêjîya demê de bo hemû kesan kêmtir dibe. Loma, em bo hemû kesên ji 16 heya 64 vaksîna xurtkirinê tewsiye dikin.

Mebest ji vaksîna xurtkirinê çi ye?

Vaksîna xurtkirinê pergala ewlebûnê ya patojenê tîne bîra mirov. Parastina herî zêde ya vaksînê vedigere û dirêj dibe.

Vaksîna xurtkirinê li kê tewsiye dibe?

Bo baştirîn parastina mimkin hemberî nexweşiya giran a Kovîd-19 ya razandina li nexweşxaneyê, vaksîna xurtkirinê bo hemû kesên 65 salî û jortir tewsiye dibe. Bi taybet bo:

- Kesên 75 salî û jortir;
- Kesên 65 salî û jortir bi nexweşiyên demdirêj bi metirsiya¹ herî zêde ya nexweşiya Kovîd-19;
- Kesên niştecih û yên tîne malên perestariyê, malên muqateya niştecihbûnê, û cihên muqateya rojane bo kesên extiyar.

Vaksîna xurtkirinê dikare arîkar be parastina hemberî tûşbûnê û nexweşiyên ne-giran û dûhatên wan (wek mînak, bandora demdirêj ya Kovîd-19, ji dest dayîna kar) zêde bibe û bi awayê demkî gerîna vayrusê li kesên ji 65 salî kêmtir kêmtir dike. Loma, vaksîna xurtkirinê li hemû kesên 16 – 64 salî jî tewsiye dibe. Bi taybet bo:

- Kesên bi taybet zîyanbar jêr 6 salî bi nexweşiyên demdirêj bi metirsiya herî zêde ya 1 bo nexweşiya giran a Kovîd-19.
- Niştecih û kesên jêr 65 salî ku tîne mala perestariyê, cihên muqateya niştecihbûnê, û cihên muqateya rojane bo kesên extiyar.
- Karkerên muqateya tenduristiyê bi tîkiliya rasterast digel kesên nexweş û muqatekarên kesên li ber metirsiya taybet.

Vaksîna xurtkirinê li hemû jinên ducanî jî ji sê mehên duyem ên ducanîbûnê û jinên şîr didin zarokan tewsiye dibe.

Kingê divê vaksîna xurtkirinê were lêdan?

Vaksîna xurtkirinê dikare herû zû 6 mehan piştî ewlebûna bingehîn a tam bi vaksîna mRNA were lêdan. Ewlebûna bingehîn a tam piştî van heye:

- du doz vaksîna mRNA vaccine; yan
- tûşbûneke erêbûyî bi koronavayrusê + dozeke vaksînê ya mRNA herî kêmtir 4 hefteyan wêdetir (bêyî li dûhevûna wê).

Ger enfeksiyona bi coronavirus re piştî vaksîlêdana mRNA ya bêkêmasî ya bingehîn hate pejirandin, qaîdeyên jêrîn tîne bicîh kirin:

- Eger tûşbûn di nava 6 mehan ji ewlebûna bingehîn de be, vaksîna xurtkirinê şeş mehan piştî wê tûşbûnê tewsiye dibe.
- Eger 6 mehan pirtir piştî ewlebûna bingehîn tûşbûn hebe, êdî vaksînkirin pêwîst nake.

Kijan vaksîn û doz bo vaksîna xurtkirinê bi kar tê?

Di bingehê de, eger mimkin e, divê heman vaksîn bo vaksîna xurtkirinê wekî ewlebûna bingehîn were bikaranîn. Eger ev nebe, vaksîna din a mRNA jî dikare were bikaranîn. Eger vaksînên mRNA yên cuda bo ewlebûna bingehîn were bikaranîn, ya xurtkirinê dikare bi yek ji du vaksînan be.

Bo ewlebûna bingehîn jî, kesên jêr 30 salî tewsiye dibin bi tercîh vaksîna xurtkirinê bi Pfizer/BioNTech lêdin.

Bo vaksîna Pfizer/BioNTech, heman dozê didin bo vaksîna xurtkirinê ya ewlebûna bingehîn. Bo vaksîna Moderna, niv dozê bo xurtkirinê lêdidin.

Li ku dikarin vaksînê lêdin?

Kanton berpîrsên vaksînkirinê ne. Li malperê yan Xeta zanyariyan (Infoline) a kantona xwe binêrin (www.bag-coronavirus.ch/kantone) ku bizanin li ku dikarin navnivîsî bikin û vaksînê lêdin. Yan jî bijîşk, dermanfiroşê xwe yan dermanfiroşiyê bipîrsin.

Zanyariyên bermayî bo vaksîna xurtkirinê û vaksîna ewlebûna bingehînê yek in û hûn dikarin wan di wê faktnamê de bibînin «*Zanyariyên giştî ser vaksînlêdana Kovîd-19 bi vaksîneke mRNA*».

¹ Xişteya/tabloya 2, rûpel 11 ya pêşniyara lêdana vaksîna mRNA: *Pênaseyên nexweşiyê ji bo kesên ku di xetereya herî mezin de ji ber nexweşiyên kronîk tîne çêkirin (bi Almanî)*

